Eleqeya ji bo pirtûkên GCSE ên bi tirkî mezin dibe

Belavkirina pirtûka "GCSE'ya bi tirkî" ku payîza borî danasîna wê hatibû kirin li dibistanên Londonê didome.



Mehmet Taşê endamê Foruma Perwerdekaran ku pirtûk amade kirine got, "Pitrûka ku me bi dilxwazî û baldarî amade kiribû li dibistanên herêmên Islington, Towerhamlet, Londona Başûr û Hackneyê hatine belavkirin." Taş diyar kir ku GCSE'ya bi tirkî di kanûna 2007'an de gihîştiye Londonê û piştî danasînê li dibistanên kurd, tirk û tirkên Kibrîsê dest bi firotana wê hatiye kirin. Her wisa firotin di ser dê û bavan re jî hatiye karin. Taş diyar kir ku kurd, tirk û Tirkên Kibrîsê yên ku li Îngilistanê hatine dinyayî an jî di temenên biçûk de hatine virê, ji pirtûkê pir hez kirine û wiha pê de çû, "Em dibihîzin ku di dersên xwe de jê sûdê werdigirin û li gorî asta xwe dibînin. Ji dibistanan daxwazên wekî 'ji her xwendekarekî re pirtûkek' hatin. Xwendekar xweşî û heyecana xwendina ji zimanê xwe yê zikmakî dijîn. Ev ji bo me hêjayî pesindayînê ye. Me hêvî dikir ku eleqe ji bo vê xebata me ya ku me bi awayekî bêpere şev û rojên xwe kirin yek û amade kir hebe. Lê me dît ku eleqe ji hêviyên me zêdetir çêbû û vê jî nîşan da ku xebatên me li ber avê neçûne."

Mehmet Taş diyar kir ku asta başbûna axaftina tirkî a xwendekarên ku tên Îngilîstanê û qeyda xwe li dibistanan çêdikin di ser GCSE'yê de ye û wiha got, "Ev azmûn ji bo xwendekarên ku asta wan nizimtri e hatiye amadekirin. Hewce nake ku kurseke salane bidin xwendekarên asta wan 'A' ye. Li gorî me piştî azmûna têketinç xwendekarên ku asta wan bilind e piştî ptatîkekê dikarin dest bi GCSE'yê bikin." Taş anî ziman ku hinek maoste ji hêla polîtîk ve dikevin şikê û wiha got, "Em dikarin bi rehetî ji her kesî re bibêjin ku pirtûk sûrî armancên polîtîk hatiye amadekirin. Foruma Perwerdekaran ne platforma tu bîrdoziyên siyasî ye û dê qet wisa nebe. Armanca xebatên me zelal e. Armanca me ew e ku perwerdehiya kurdî û tirkî bigihînin asta zimanên din. Heta ku ev armanca me bi cî bê, em ê xebatên xwe bênavber bidomînin."